

## Hun dikarin çî bikin?

**1. Ji bo ku Mor Çatî xebatên xwe ên piştgirîya jinan û parestgeha bidomîne hûn dikarin hejmara ku li jêrê hatiye nivisandin re bexş bikin.**

### TL Hesabî

Vakıfbank, Beyoğlu Şubesi, Mor Çatî Kadın Sığınağı Vakfı  
Hesap No (TL): 00158007285291667  
IBAN: TR04 0001 5001 5800 7285 2916 67

Garanti Bankası Halaskargazi Şubesi  
Şube Kodu: 701  
Hesap No (TL): (701)-6299105  
IBAN: TR92 0006 2000 7010 0006 2991 05

### Euro Hesabî

Vakıflar Bankası Beyoğlu Şubesi  
Şube Kodu:26  
Hesap Numarası: 00158048000402264  
IBAN: TR19 0001 5001 5804 8000 4022 64  
Swift Kod: TVBATR2A

### Dolar Hesabî

Vakıfbank Beyoğlu Şubesi / 026  
IBAN: TR27 0001 5001 5804 8011 1469 07

**2. Ji bo dilxwaziya Mor Çatîyê hûn jî dikarin beşdarê xebatên atolyeyan bibin**

Mor Çatî tekoşîna xwe a li dijî zordariya jinan bi rêya dilxwazên xwe roj bi roj xurttir dike. Ji bo mirov wek dilxwaz bixwazê di Mor Çatîyê de cih bigre divê beşdarê xebatên atolyeyan bibe. Dilxwaz di xebatên atolyeyan de haydarîya zordariya li ser jinan, di vê mijarê de dîroka tekoşîna Tirkîyê, pergala dadgehî û li ser xebatên sazîyên jinan de li gor rêbazên femînîst tên agahdar kirin. Xebatên dê tên kirin tenê bi kêrî Mor Çatîyê nayên ji xeynê vê bi ji bo pêşketina dilxwazan ji bi kêr tîn.

**3. Hûn jî di hin mijaran de dikarin piştgirîya me bikin.**

Hûn ji aliyê tenduristî, kompîtir (bilgisayar), ragihandin, wergerê de û ji bo Xebatên Mor Çatîyê ên rojane de dikarin alîkariya bikin. Ji bo vê hûn dikarin ji heftê çend saet (saetek du saet jî dibe), an jî di nav mehê de çend rojên xwe diyar bikin û bibin alîkar.

**4. Sazî jî dikarin piştgirîya me bikin.**

Li dijî zordariya jinan Projeyên berpirsariyê ên civakî dê hûnê bi rêkin dikarin bi alîkariya Mor Çatîyê bimeşînin. Problema herî mezin jî ewe ku jinên di bin zordariyê dene nikarin jiyanek nû ji xwe re ava bikin ji ber ku dîtîna karekê wiha ne ewqas hêsane. Piştgirîya herî baş ji aliyê sazîyê ve bê kirin ji bo jinan di karekê de bicîhkirin an jî bi perwerdehî dîtîna karekê û ji bo zarokan derfet bînin.



Katip Mustafa Çelebi Mahallesi  
Anadolu Sokak No: 23  
Beyoğlu / İstanbul  
Tel: 0212 292 52 31 - 0212 292 52 32  
Faks: 0212 292 52 33  
E-posta: morcati@morcati.com  
www.morcati.org.tr

# WEQFA MOR ÇATI A PARESTGEHA JINAN JI BO DINYAYEK BÊ PARESTGEH HER BIJÎ TEKOŞÎNA ME

## Tekoşîna me ya zordariya li dijî jinan û Mor Çatî

Çawa li ser ruyê dinyayê zordariya li dijî jinan heye, li Tirkîyê jî li gor mafê mirovan zulmeke mezin tê kirin. Di van salên dawî de hin lêkolîn didin nîşandan ku ji her 10 jinan 4 jin li malê ji mêrê xwe an ji hevalê xwe lêdan dixwe. Bi ser de jî zordarî tenê bi lêdanek fîzîkî naqede. Di nav malbatê de him zordariyek bi devkî, him aborî, him psîkolojîk him jî ji aliyê zayendî ve di bin zordariyê dane. Di bin vê zordariyê de serdestiya mêran heye û ji xwe bi her hawî zulm dîkin. Ji xeynî vê, tê zanîn ku mêr zulm û zordariyê li zarokan jî dîkin. Zirarek wisaye ku zarok di bin brîndarbûna fîzîkî, tirsonekî, ji xwe nebawerî û kesayeteke kêmketî de dimînin.

Mêr heke ku bibîne serdestiya wî dikeve bin talûkê an jî heke bixwaze serdestiya xwe zêdetir bike dest bi zordariyê dike. Di nava van zulm û zordariya de ya herî giran jî kuştina jinan e. Her çiqas agahiyên fermî têr nekin jî, buyerên ku medyayê de cih digrin dide zanin ku rojê herî kêr 5 heb jin an jî mêrê xwe, an jî ji aliyê yarê xwe ve tê kuştin. Weke tê zanin ku sedema zordariya li dijî jinan tev ji serdestiya mêrane. Ev zordarî jiyana jinan dixwe talûkê û ji ber vê yekê jî divê em bi çaralî tekoşîna vê dozê bikin.

Weqfa parestgeha jinan Mor Çatî, di Tirkîyê de rêxistineke yekemine ku li dijî zordariya jinan tekoşîn dike. Di sala 1987 de bi pêşengiya femînîstan û bi beşdariya bi sedan jinan li Stenbolê piştî kampanyaya bi navê "ji bo zulm û zordariya li ser jinan re tekoşîn" yekitiya jinan destpêkir. Piştê jî weqfa Mor Çatî vebû. Ev kampanya di dîroka Tirkîyê de ji bo tekoşîna jinan gellekî girînge. Ji xeynî vê yekê jî daye nîşandan ku, xebatên avakirina saziyên piştgirî û parestgeha ji bo jinan çiqas girînge.

## Navenda Piştgiriya Jinan Alîkarî dike

Ji sala 1990'an vir ve dilxwazên Mor Çatîyê jinên ku di bin zordariyê de mane re piştgirî dike. Ji navenda Mor Çatî, her roj kêr zêde bi deh jinan re an bi telefonê, an rû bi rû hev dîtin pêk tîne. Navend xebatên xwe ne ji bo alîkariyê, ji bo jinên ku di bin zulm û zorê de mane re, ku bi hev re tekoşînek lidarxin pêk tîne.

## Piştgiriya dilxwazan:

Ji bo mirov di Mor Çatîyê de bibe aktivîst divê beşdarî xebatê atolyeyê bibe. Dilxwazê Mor Çatî, ji ber ku di bin zordariyê de ye bi jinan re giştî pêşî bi telefonê hevdîtin pêk tîne. Piştê rû bi rû hevdîtin pêk tîne û ji bo çareseriyek, bi hev re rewşê dinirxînin. Bi jinan didin bawer kirin da ku ew xwe sucdar nebînin. Jin, ji bo wan çareseriyê herî baş kîjan be ew bixwe biryar didin. Dilxwazên Mor Çatîyê jinên ku hatine rizgarkirin nînin. Ji ber vê yekê jî dema serlêdanek çêdibe meselê bi çar alî dinirxîne.

## Piştgiriya psîkolojîk:

Ji bo rewşa ku jiyana wan di bin zordariyê de tarî bûye, tu hevî nehêştîye, tirs û şerm bi serde jî ji bo jin xwe ji bin sûcdariyê rizgar bike Mor Çatî bi şewirmendiya psîkolojîk piştgirî pêk tîne. Hevîya me ewe ku yê vê xebatê bike divê bi tu hawî jina sucdar nebîne û nebêje jin zordariyê heq dike. Bi kurtasî psîkologên ku piştgiriya jinên di bin zulmê de bike, divê xwedî nêrinek mafê jinan be.

## Piştgiriya Huqûkî:

Jinên di bin zulm û zorê dene bi giştî hay ji mafê xwe ê zagonî nine an jî nizane. Pêdiviya huqûkî (dadî) bi parêzêrên me ê dilxwaz peyda dibe. Di warê huqûkî de pir hatîye dîtin ku heke ji aliyê jinan ve erênîyek baş hebe jî, ji aliyê dadgeha ve zû bi zû pêk nayê. Ji ber vê yekê jî parêzêrên me ên şewirmend jî divê xwedî nêrinek mafê jinan bê û bi dil û can parêzerî bike. Ev gellekî pêwiste.

## Em xebatên parestgeha dimeşînin

Mor Çatî heya îro di avakirina 3 heb parestgeha de cih girtiye. Parestgeha yekem di navbera 1995-1998 de hat avakirin. Ev parestgeh ji bo 350 jin û 250 zarokan re deriyê jiyaneke bê zulm û zordariyê vekir. Di sala 2005'ande dema Bankeya Dinyayê ji bo parestgeha jinan ji Qeymeqamiya Beyoglu re qedî vekir, qeymeqamî jî pêşniyar kir da ku xebata vê parestgehê bila Mor Çatî bimeşîne. Ev hevkarî ji ber ku saziyek dewletê piştgiriya rêxistineke jinan dike re bû wek mînak û li gor genelgeya bi hejmarê 2006/17 a serokwezîriyê ku dibêje "li dijî zulmê zordariya li ser jin û zarokan re dê tekoşîn bê kirin" re bi pêk dihat. Mor Çatî bi parêzer, pirsborê civakî, psîkolog, psîkiyatir û bi tevahî bi dilxwazê bingeha xwe re vê xebatê 3 sal meşand. Qeymeqamiya Beyoglu sala 2008'de ji ber kû nikare fînanse bike vê xebatê da sekinandin. Ji bo ku xebat bimeşe gellekî rêxistinên jinan çûn meclîsê ji mebûs û wezîran re bang kirin da ku bila berpirsariya xwe bi cih bînin û li gor zagonan tevbigerin.

Mor Çatî ji sala 2009'an vir de xebatên serbixwe ên parestgehê bi Şaredariya Şişliyê, Encumeniya Ewropa Delegosyona Tirkîyê û bi heval û hogirê Mor Çatîyê re dimeşîne. Di vê demê de hejmarê jin û zarokên ku parestgehê de diman 200 kes bûn.

## Em di atolyeyan de Tecrubeyên xwe parvedikin

Navenda hevkarîyê û parestgehê ji bo zordariya li ser jinan bê fêhm kirin û haydarî çêbe û li gor şert û mercên feministî bîn meşandin 2 heb atolyeyan de xebatên kirin. Ji van atolyeyan a yekem ji bo ên bixwazîn bibin dilxwazê Mor çatîyê xebata xwe dimeşîne. Ya din jî ji bo yên ku di saziyê de wek profesyonel bixebitin tê meşandin. Heya îro li dora 10 heb şaredarî ji bo ji xebatên Mor Çatî tecrube bigrin xebata atolyê xwestin. Hejmara atolyeyên bi rêxistinê jinan re hindik maye bigihîje sedî.

## Em alîgirê jinên bindest in!

Mor Çatî ji bo fehmberiya tekoşîna li dijî zulm û zordariya li ser jinan xurt bibe, di zagonan de peymanên navnetewî çî dinivîse pêk tîne an pêk nayê dişopîne. Dema di pêkhatinê de problemek derkeve ji bo çareseriyê problemê kesên bi vî karî re eleqedarin agahdar dike û bala wan dikêşe ser wê problemê. Ji xeynî Mor Çatî bi Rêxistinên din ên jinan bi hev re pêvajoya huqûkî, li gor ifadeyên jinan agahiyên hatine bi destxistin dişopînin, ji bo ku rêyeke nû ji jinan re vebe çalekî û kampanya lidarixin. Ev xebat rêya çareseriyê problemên jinan baştir vedikê.

## Em di Komcivînan de Tê Cem Hev

Bi pêngava Mor Çatî ji sala 1998 vir ve her sal bi xebatkarê saziyên ku li dijî zordariya jinan tekoşîn dîkin re (Şaredarî, SHÇEK, ) her sal komcivînê damezrandin. Parestgeh, şewirmend û navendên piştgirîyê re yekitiyek ava dibe, bi vê yekitiyê re tecrube û agahiyên nû tîne parvekirin.

## Pergala Xebatê

- Di Mor Çatî de biryar bi pergala qollektîf tîne stendin.
- Mekanîzmeyek hiyerarşîk tune ye, ji bo hiyerarşî çênebe cudatiya hevala tê bikaranîn.
- Rayedarî û berpirsariyê herdem diguhere. Bi vî hawî zanebûnê û agahî li ser milê kesekî tenê namîne.
- Xebat li gor daxwaza dilxwaza belav dibin, kê beşdarê kîjan xebatî dibe bila be, lê kê çî xebatê dabe berxwe divê nivî nehêle.
- Her çiqas li ser mijarekê serkeftin muhim be, beşdarbûna pêvajoyê jî ewqas muhime. Biryar bir hilbijartinê naye dayin. A grîng ew e ku biryar bi diyalogê bê dayin.